



PDKÎ Û KUMELÊ HILBIJARTINÊN SEROK KOMARIYÊ BAYKUT KIRIN

► Baykutkirina berfireh a hilbijartina Serok Komariya Îslamî, erkeke nîştimanî û pêngaveke girîng ya demokratîk ber bi gihîştin bi azadiyê ye

Qirar e ku dehemîn gerra şanogeriya hilbijartinên Serok Komariya rejîma Îslamî a Îranê roja 16'ê Hezîrana 2009'an bihê lidarxistin. Her weke çavniherî dihat kirin, Konseya Parêzvan (Şêwra Nobedar) di nava wan 475 kesana de ku xwe berbijar kiribûn, tenê selahiyet û kêrhatîbûna 4 kesana erê kir. 1. Mehmûd Ehmedînejad, 2. Musin Rizayî, 3. Mehdî Kerûbî û 4. Mîr Husên Mûsewî ku her 4 ji wan mohrên sereke û payebilind yê rejîma Komara Îslamî ne weke berbijar hatin diyarîkirin.



Di daxuyaniyê hevbeş de, PDKÎ û KOMELE' yê, hilbijartinên gerra dehemîn a hilbijartinên Serok Komariyê baykut kirin. Deqa daxuyaniya han di rûpela 2 a ve hejmara Agirî de bixwînin...

Xaminyê Parêzgeha Kurdistanê Mîltarîzetir Kir Û Vegeriya

► Xaminyê, rêberê olî yê Şoreşa Îslamî a Îranê, di bereberê hilbijartinên serok komariya meha tê ya Îranê de, bi armanca propaganda ji bo hilbijartinan û handan û rakêşana xelkê Kurdistanê bo ser sîndiqên dengdanê, tevî malbata xwe û hinek rayedarên dewletê seredana parêzgeha Kurdistanê kir. Ji roja sêşem, 12'ê Hezîrana 2009'an, Xaminyê bo dema 8 roja li parêzgeha Kurdistanê, yek ji 4 parêzgehên Kurdistanê ma û seredana bajarên Sine, Merîwan, Bîcar û Seqîzê kir. Bona ku rêûresmên pêşwazîkirin ji wî mezin û berfireh bihên nîşandan, xelkê zaf ji bajarên din yê parêzgehên derdorê bo pêşwaziya wî bo wan bajarên ku Xaminyê seredana wan kir, hatibûn anîn.

Ji ber serdana Xaminyê bo parêzgeha Kurdistanê, hezaran hêzên leşkerî û ewlekariyê ji Teheranê û bajarên din bo bajarên Parêzgeha Kurdistanê hatibûn anîn û rewşa leşkerî û ewlekariyê bi ser hemû bajarên de zal bû, rewşek ku 30 sal e bi ser hemû bajarên Kurdistanê her dom dike. Bi hatina Xaminyê ji bo parêzgeha



Kurdistanê, hemû bajarên vê parêzgehê hatin mîltarîzekirin û siyaseta lînerîna ewlî bi Kurdistanê her dom kir û çî nehat guhartin.

Di axavtinên xwe yê li her çar bajarên û di kombûn û civînên din de, wî herî zêde bal kişande ser girîngiya beşdariya xelkê di hilbijartinên wê rejîmê de û daxwaz ji xelkê kir ku bi awayekî çeleng beşdarî hilbijartinan bibin. Ji ber ku di dewreyên borî de, xelkê Rojhilatê Kurdistanê herî kêm beşdarî şanogeriya hilbijartinên wê rejîmê bûne. Her wiha wî doz û pîrsa herheq a Kurd, weke pîrsek olî û Îslamî û di çarçoveya hinek mafên kûltûrî de hesiband.

Doma Nûçeyê di rûpela 6'an de...

Şanogerî bona gihîştin bi...		Nav jê çî be, pirsgirêk ya Kurd e...		ZANIST	
3		4		9	

Di daxuyaniyeke hevbeş de;

DU PARTIYÊN KURDISTANA ÎRANÊ DAXWAZA BAYKUTA HILBJARTINÊN SEROK KOMARIYA ÎRANÊ KIRIN

Daxuyaniya hevbeş derheq baykutkirina gerra dehema ya hilbjartinên Serok Komariyê li Îranê

Di civakek demokratîk de xwediyê sereke yê desthilatê xelk e û ji bo xuyabûna wê xwedîtiya xelkî, li gora qanûnên demokratîk û pejirandiyên xelkê, hilbjartin ji bo dezgehên cur bi cur û yek ji wan serkomariyê tê lidarxistin. Di civakeke wisa de xwe berbijarkirin ji bo her postekê mafê bê vir û wir ê xelkê ye û tenê xelk dikarin li ser kêrhatîbûn û xwedîşyanbûna kesekê deng bidin nek ciheke din berbijaran ji wan re destnîşan bike. Di vê awayê rêvebirina welat de her di yekem qonaxa xweberbijarkirinê de heta propagandaya hilbjartinê û prosesa dengwergirtinê bi xwe û piştre ji çavdêrî û zêrevanî bi ser desthilat û kesê/a hilbjartî ve, mafê sereke bo xelkê vedigere û hemû pîrensîp û qanûnên diyarker yên rê û cihan, di qanûneke demokratîk a çihê pesend û qebûla xelkê ve çavkanî digire û divê desthilat birêveberiya wan yasayên demokratîk bike û bersivderê xelkê bibe. Lê tevahiya wê proseyê di Komara Îslamî û li gora qanûna bingehîn a wê rejîmê de yê hatiye têkdan û berevajikirin û şêl û awayê şanogeriyeke xapîner bi xwe ve girtiye.

Rejîma Komara Îslamî di doma şanogeriyan xwe de, bo careke din dixwaze bi lidarxistina prosesa çewaşekirî a hilbjartinan, kesekî weke Serok Komar diyarî bike û di vê proseyê de bi anîna xelkê bo ser sindoqên dengdanê, rewayiyekê li ber çavê zêrevanên cihanî ve ji bo rejîma xwe werbigre. Ewa ku ji berbijarên diyar ên vê dewreya bi nav dilbjartinan de bi ron û eşkere xuya ye, hevtaî û li hev şibiyana wan kesane yê ku her yek ji wan bi dirêjahiya salên desthilatdariya Komara Îslamî, di tawan û diktatoriyeta rejîmê de dest hebûne û hemû mohreyên nava dezgehên Wîlayeta Feqîh in û bûne ku bi cudahiyeke gellek kêr her yek ji wan çax û serdemekê birêveberên tawan û stemkariyên rejîmê di beşên cuda cuda ên leşkerî, ewlekarî û teror, dezgehên rêveberên tawan yan sazîyên talanker bûne û karnameyeke reş a dijîgelî hene.

Bi daneberhev û nixandina her yek ji berendamên berbiçav yên rejîma Komara Îslamî, çirûskêk dilpêxweşker bona xizmet bi xelkê di wan de nahê dîtin, lê girîngtir ji kesayetiya wan a takekesî, naverok û çawabûna dezgeha Wîlayeta Feqîh û rejîma Komara Îslamî ye ku bi şîrove û dahûrandina pêkhate û bingeh û ramana pêkînerê wê rejîmê, em bi ron û eşkere dibînin ku dengê azadiya xelkê û posteke hilbjartî bi tu awayekê têde çih nabe. Heke Serok Komar kesayetiyeke azadîxwaz, xwedî bawer û raman be û biwêriyeke zaf jî hebe, di vê sistêmê de bona xizmetkirin bi xelkê tu desthilatek tu nabe, lê bona serkut û qirkirinê desthilatek zaf û berfireh jê re tê dayîn. Makezagona Komara Îslamî li ser binêşe û binegaha wê bir û ramanê hatiye avakirin ku xelkê bi savilke dizane û divê Wîlayeta Feqîh heta curê lixwekirina kinc û cilûbergan jî ji bo wan diyarî bike û di vê

pêkhateya zorxwaz û hişk de, tu deng û rengeke cuda nahê wergirtin û bihîstin, ger di xizmeta Wîlayeta Feqîh de nebe û Serkomar tenê divêt birêveberê baş yê xwestekên dijîgelî ên dezgeha Wîlayeta Feqîh be.

Qanûna sedsalên navîn ya Komara Îslamî ku kakil û naverokeke paşverûyane heye û tenê bona tevlihevîkirin di hinek cihan de rengeke perrî yê îroyîn bi serde rijandine, rêyê nade kesekî din ku siyaseta û bernameya stîratejîk di welat de destnîşan bike, siyaseta demdirêj û dereve, aborî, hêza leşkerî û ragihandinên giştî û wd... di destê Wîlayeta Feqîh de ne û her demekê jî hez bike, dikare Meclîsa kartonî hilweşîne û Serok Komar jî ji kar bavêje.

Di cihana azadî de hilbjartin û hilbjêran mafê destpêkî yê xelkê ye, lê di nava sistêma Komara Îslamî de, piraniya herî zêde a xelkê nikarin ji bo Serok Komariyê berbijarê/a xwe hebûn û tenê mêrên xwedî Ola Şeyxa Donzdeh Îmamî ên ku bawerî bi Wîlayeta Feqîh ew jî li cura "Mutleqe" (reha) mafê xweberbijarkirinê hene û li gora ceribîna gerrên berê û ya vê carê jî, tenê mohreyên rejîmê ku bi tevahî wefadariya xwe bi Wîlayeta Feqîh selimandibin, dikarin navê wan di nava listeya berbijaran de bimîne û yê ku di dawiyê de ji sindoqên dengdanê ser derdixe, encama dijhevî û rikeberiya nava destek û bandên rejîmê ye û di xizmeta dezgeha Wîlayeta Feqîh de dibe nek xelkê.

Salên desthilatdariya rejîma Komara Îslamî nîşan daye ku heke Serok Komar libekê ji ferman û emrê Wîlayeta Feqîh derkeve, zû bo ser hêla Wîlayeta "Mutleqe" (reha) yê hatiye anîn. Di serdemê teji senaryoya fêlbaziya reformxwazên dewletî de, bi hemû postên

Baykutkirina berfireh a hilbjartina Serok Komariya Îslamî, erkeke nîştimanî û pêngaveke girîng ya demokratîk ber bi gihîştin bi azadiyê ye

hilbjartî nekarî heta qanûnên Komara Îslamî jî rêve bibin û rê ji wan re nehat dayîn ku yek xala qanûna bingehîn bi awayekî libekê cuda ji xwesteka Wîlayeta Feqîh biguherin. Dawiya wê dewreyê jî ji hemûyan re derxist holê ku tenê bona domandina temenê rejîmê hatibûn û naveroka axavtînen hemû berbijaran, tenê û tenê parastina sistêma Wîlayeta Feqîh û dirêjkirina temenê rejîma Komara Îslamî bûye û çî din. Ewa ku hebûna wê tune ye, baskirin ji xwestekên rasteqîne ên beşên cur bi cur ên civakê û daxwaziya neteweyên Îranê ye.

Civata Îranê ku ceribîna 30 sal desthilatdariya teji serkut û tawan ya Komara Îslamî derbaz kiriye, xwediyê xwestek û daxwaziya rewşa azadîxwazane ye ku tu yek ji wan di çarçoveya vê sistêmê de nahê çî. Neteweyên Îranê, ji stem û zordariya çend qatî ya rejîmê bêzar bûne û daxwaziya gihîştin bi maf û azadiyan û pêkhatina sistêmeke demokratîk û federal in ku di çarçoveya vê îdeolojiya berteng û teskbîrane de bicî nahên. Serok Komarên yek li pey hev ên rejîma

Komara Îslamî ji bilî kuştin, îşkence, gef û tawan, çî ji bo neteweya kurd bi diyarî neanîne. Ji wê rojê şûnde ku Xomeynî fermana cîhadê li dijî neteweya kurd derkir, heta niha dezgeha Wîlayeta Feqîh ji rêya Sipaha Pasdaran û Wezareta Ewlekarî û organên cur bi cur ên ser bi Serok Komariyê, li Kurdistanê û li dijî kurd sûç û tawan afirandine û karnameya wan teji kuştin û malwêranî ye.

Neteweya Kurd li Kurdistanê Îranê weke neteweyên din li Îranê, daxwaza bi fermî naskirina maf û azadiyên wî û cihgirbûna wan mafane dike ku weke neteweyek bi nasnameyeke taybet a xwe ve di birêvebirina Îranê de beşdar be û xwediyê desthilata xweçihî û demokratîk a xwe be û di wê pêxemê de jî xebateke teji rûmet û şanazî meşandiye û ji kesê qebûl nake ku wan daxwaziyan biçûk û bertesk bike û di çend xalên bînaverok de sînoard bike û ev neteweya mafxwaz bi vê yekê gihîştîye ku di çarçoveya rejîma Komara Îslamî de armancên neteweya Kurd nahên çî.

Di rastî de bêparkirina xelkê li proseya siyasî ya welêt bi dirêjahiya desthilatdariya Komara Îslamî ji aliyê desthilatdaran û qanûna bingehîn a rejîmê ve, astengeke sereke a li hember xwesteka xelkê bona beşdarî di vê proseyê de ye û bûye. Diyarîkirina her yek ji mohreyên rejîmê weke Serok Komar, nikare bandorek di pêvajoya bicîhatina daxwaziyan herî destpêkî hebe, civaka Îranê û neteweyên Îranê ji vê çendê hişyartir in ku bi wan fêl û derewan bixapin û di vê rewşa hassas û peljen de ku rejîm li hundir û derveyî Îranê rastî qeyrana çaresernekirî hatiye, dizanin ku rejîm tenê dixwaze rewayî û berheqiyê ji bo sistêm û desthilata xwe bidest bixe û encama vê gerra binav hilbjartinan, tenê serkutkirina zêdetir û kûrtirbûna pîrgirêkên civakê dibe, lewra erk û wezîfeya ser milê hemû azadîxwazên Îranê û hemû xebatkarên neteweyên bindest û tev welatparêzên Kurd e ku bi aqahî û zanyarîdan û haydana xelkê, li batî amadebûn li ser sindoqa rewayîdan bi Komara Îslamî, refên xebata tevalî xurtir bikin.

Em daxwazê ji bi hemû tex û qatên xelkê Îranê û herwiha neteweyên Îranê û nemaze neteweya mafxwaz û hişyar a Kurd dikin ku bi baykutkirina şanogeriya hilbjartinan, bi neçûna xwe bo ser sindoqên dengdan bi tawanbaran, rê li serkevîna komplo û pîlanên rejîmê bigirin û li ber çavê cihanê nîşan bidin ku rejîma Komara Îslamî tu hitbar û pêgehek di nava xelkê de nîne.

Baykutkirina berfireh a hilbjartina Serok Komariya Îslamî, erkeke nîştimanî û pêngaveke girîng ya demokratîk ber bi gihîştin bi azadiyê ye.

**Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê
Komeleya Şoreşgerên Zehmetkêşên
Kurdistanê Îranê
19'ê Gulana 2009
29'ê Banemera 1388**

Şanogerî bona gihîştin bi meşrûiyeteke rûyekî



Azad Kurdî

Kêmtirî mehekê ji bo birêveçûna sînyaroya dehemîn gerra hilbijartinên Serok Komariya rejîma Îslamî a Îranê dem maye. Hilbijartinek ku biryar e di 22'ê Cozerdana 1388 (16'ê Hezîrana 2009)'an bihê lidarxistin û ji bo heyamê çar salan karbidestekî din yê çihê hitbar û baweriya rejîma Komara Îslamî, bihê ser kar û xizmetê bi dirêjkirina temenê desthilatdariya biyom a wê rejîmê û xizmet bi berbipêşvebirina armancên rejîma Melayan bike. Li rojeva pêş navnivîsîna berendamana û her wiha pêşdîtinên piştî bêjîngkirina berbijaran ji aliyê Konseya Parêzvan ya rejîma Îslamî ji bo vê şanogeriyê, wisa derdikeve holê ku rewşeke sar dê çavniheriya hilbijartinên vê gerrê bike.

Ji bo dehemîn dewreya hilbijartinan, 475 kesan navnivîsîn kirine, di halekê de ku di gerra borî de, 1014 kesan navnivîsî kiribû, serhejmariya vê gerrê li gor dewreya berê 53 ji sedê kêmkiriyê. Lê xuya ye ku ji bilî çend kesên taybet û naskirî ên rejîmê nebe, dê selahiyet û kêrhatîbûna hemû kesên din ji aliyê Konseya Parezvan (Şêwra Nobedar) ve bihê redkirin. Di her neh gerrên borî ên hilbijartinên serok komariya rejîma Îslamî de, wê şêwra 12 kesî ya rejîmê ji wan çend sed kesên ku xwe berbijar dikin, tenê kêrhatîbûna 4- 8 kesan erê kirine. Bêguman vê carê ji dê her wisa be.

Çavniherî tê kirin ku rikeberiya rûyekî û sereke ya vê gerrê dê di navbera Mehmûd Ehmedînijad û Muhsin Rizayî ji baskê zorxwaz û Mêhdî Kerûbî û Mîr Husên Mûsewî ku xwe weke berendamên baskê bi nav reformxwaz dizanin, bibe. Pîrr dijwar e ku kesên mîna Dr. Qasim Şulesedî û Ekber Elemî û kesên din, nemaze ew 42 jinên ku vê carê xwe berbijar kirine, bikarin ji bêjînga û zerebîna Welîyê Feqîh (rêberê Olî yê rejîmê) derbaz bibin. Lewra rikeberî dê di navbera Ehmedînijad û ew çend mohreyên din ên naskirî yên rejîmê de be ku niha di rojevê de ne, heta bi bidestxistina wê postê bêtir di xizmeta sîstema dîktator a rêberê olî yê rejîma Îslamî a Îranê de bin û temenê wê rejîma serberedayî û azadîkuj dirêjtir bikin.

Piraniya berbijaran li hewl û ceħda rakêşana bala xelkê ber bi aliyê xwe û dana hinek dirûşman in ku hejmarekî zaf ji xelkê bona berheqîdan bi rejîma Welayeta Feqîh û razîkirina dilê Xamineyî, bikişînin ser sîndoqên dengdanê. Di heyamê borî de, hinek car

rikeberên eslî ên Ehmedînejad, bi awayekî rûyekî rexneyên sivik ji siyaseta derve û bernamêyên aborî ên dewleta nehem anku Ehmedînejadê berdilê rêberê olî digirin û me dît ku rêberê olî (Xamineyî) di axavtina xwe ya çend rojan berî niha li bajarê Sine de çawa rondik ji Ehmedînejad û dewleta wî re barandin û bi tundî êrîş kire ser wan kesan ku heta wan rexneyên sivik û sade ji serkomarê destnîşankirî yê wî digirin û piştî jî bi awayekî nerasterast ji wî re propaganda kir û heta daxwaz jî kir ku deng jê re bidin. Ji bilî hinek dirûşmên pûç û dubarekirî, tu yek ji berbijaran bernamêyê ron û bi bandor di warên siyasî, aborî, civakî û çandî de tune ye.

Helbet Mehdî Kerûbî di daxuyaniyekê de bi rûyekî soza çibîckirina mafên kêmaniyên olî û netewî daye û Ekber



Dîmenek ji civîna reformxwazên hukûmê û ên Kurd ku piştîgiya reformxwazên dewletî dikin

Elemî jî li ser wê pirsê tekez kiriyê. Pirsên ku bi awayekî piratîkî hêla sor ya rejîma Îslamî tê hesibandin û her kes dizane ku çibîckirina wan di çarçoveya wê rejîmê û qanûnên wê de gellek dijwar û zehmet e û Kerûbî tenê weke dirûşma Propagandayê û bona bidestxistina dengê neteweyên Îranê û kêmaniyên olî mifahê jê distîne, her weke Xamineyîyê Welîyê Feqîh yê wê rejîmê li bajarê Sine gefa vê yekê xwar ku lênihêrîna Komara Îslamî a Îranê ji bo Kurdistanê, nêhêrîneke Îslamî ye û her kes cuda ji vê eslê bifikire, li dijî hêlên fikrî ên Komara Îslamî tevdigere. Ji ber ku biryarderê eslî û sereke di rejîma Îslamî ya Îranê de Xamineyî ye.

Yek ji pîvanên sîstem û civakek demokratîk pêkanîna hilbijartina azad e, bi awayekê ku xelk bikare bi şêweyekî rasterast û bi vî û îradeya xwe bi ser çarenivîs û hilbijartina nûnerên rasteqîne ên xwe biryarê bidin û di proseya hilbijartina azad de, rola civakî û siyasî ya xwe di wê sîstema demokratîk de bilîzin û piraktîze bikin.

Lê di rastî de ji bo rejîma Îslamî a Îranê eva ku girîng û armanc bûye û heye, hatina hejmara zaf û berfireh a xelkê bo ser sîndoqên dengdanê û wêne û filmhilgirtin bi rêya kamerayan ji wan dîmenan û nîşandana wan ji bo raya giştî a cîhanê û jêst û pîrestîjgirtin bona nîşan dana xelkîbûna rejîma wan bûye û heye. Bi kurt û kinî, di rejîma Îslamî a Îranê de, hilbijartin weke proseyek demokratîk bona rêzgirtin ji viyan û îradeya xelkê nahên lidarxistin, belku zêdetir ji bo nimayîşkirina desthilat û berheqdan bi hukûmeta wan bi xwe ye, awayek ku piraniya dewletên dîktator û tatalîter birêve birine û dibin. Bi sedema rewşa hessas û peljen ya vê carê a hilbijartinan, ev pîrse zêdetir xwe dide holê. Bi awayekê ku baykut û beşdarînekirina xelkê di hilbijartinên gerra vê carê de, nigeraniyê zaf ji bo rayedarên rejîma Îslamî pêk aniyê, lewra desthilatdarên rejîma Melayan û nemaze dewleta Ehmedînejad hemû hewl û ceħda xwe yê xistine kar da ku di pêxema meşrûiyet û rewayîdana rûyekî bi hukûmeta xwe, dest bi bikaranîna mekanîzmên fend û fêlbazane bikin.

Bo mînak, Wezareta Hundir a rejîma Komara Îslamî a Îranê hejmara ew kesên ku dikarin di hilbijartinên vê gerrê de beşdariyê bikin, 46 milyon kes ragihandiye, eva di halekê de ye ku navenda serhejmariya netewî a Îranê hejmara han 51 milyon û 300 hezar kes îlan kiriyê. Di vê navberê de ne xuya ye ku çarenivîsa wan 5 milyon dengên din dê çî jê bihê?! Ji aliyekî din ve jî, Wezareta Hundir bi hevahengiya Konseya Parêzvan, 57 milyon bergên taybet bi dengdanê ji bo dehemîn dewreya hilbijartinên Serok Komariyê çap kiriyê.

Dehemîn gerra hilbijartinên Serok Komariyê di demekê de li bereberê birêveçûnê ne ku rejîma Komara Îslamî a Îranê di yek ji qonaxên herî peljen û hestiyar ên dîroka sî saliya xwe de derbaz dibe, ji aliyekê pîrsgirêk û arîşeyên siyasî, aborî û civakî yên hundirê Îranê ku yê bûne kirîz û bê çareseriyê bingeşîn mane û nerazîbûneke berfireh a sîvil û xelkî û çelengbûn û hatne meydana hêzên civakî li seranserê Îranê li dijî siyaseta desthilata Welayeta Feqîh yê lê ketiyê, û ji aliyê din ve jî rejîma Îslamî a Îranê digel kirîzeke kûr a siyasî di asta herêm û navneteweyî de berbirû bûye. Lê ji bo xelkê Îranê û azadîxwazên Îranê, hilbijartina vê carê jî weke carên din tenê şanogeriyek e ji bo gihîştin bi rawayî û berheqiyê rûyekî ji bo rejîma Îslamî a Îranê.

RONÎ

Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên "Agirî" re

Ebdullah Hicab



Nav jê çi be, pirsgirêk ya Kurd e

Ev gotina serokkomarê Turkiyê, Abdullah Gül, li wan rojên dawî, gumanek wisa çê dike ku gelo tu

bêjî karbidestên Turkiyê rastiya pirsê Kurd fem kiribin û niha bixwazin ji riyên çareseriyê bigerin. Her nebe piştî 80 sal înkâr û bi dehan sal hêriş û şer û hewlên tunekirinê, dihat payîn ka gelo, serokê Xwedatirs û hevpartiyên wî yên di AKP'ê de ku bi dengên kurdan weha di siyaseta Turkiyê de xurt bûn, dê çi rêçareyekê ji pirsê Kurd re bînin rojevê? Vekirina kanala televizyonî a TRT6, li pey wê re jî radyoya Kurdî û hinek îşaretên di dema hîlbijartina şaredariyan di Adara îsal de hatibûn dan, weke nîşaneyên erênî dihatin dîtin. Lê kiryarên dewletê û zext û zora ku bi berdewamî li ser tevgera Kurd li bakûrê Kurdistanê tê meşandin, tiştêk dinê derdixin holê. Diyare dîsan, li gor gotina kevnare ya kurdî **"rûyê sipî yê mele" zêde ne ciyê baweriyê ye"**.

Li hember hewlên li pey hev yê tevgera Kurdistanê û mesaja aştiyê ya ji aliyê bi milyonan kurdên beşdarî rêûresmên Newroza 2009'an li hemû bajar û gundên Bakurê Kurdistanê û metropolên Turkiyê hatibû dan, dewletê ji Newrozê ve êrişek xurt bo ser tevgera Kurdistanê dest pê kiriyê. Ji bombebarana herêmên ser kewşen re bigre heya operasyonên leşkerî, artêşa Turkiyê hemû îmkanên xwe li dijî tevgera Kurd li Kurdistanê xistiye kar. Di qada siyaseta sivil de jî, ne tenê tu deriyên demokratîk yê nû bi ser gelê Kurd de venebûne, belkû pêşiya daxwazên demokratîk ên xelkê ji caran zêdetir hatiye girtin. Hêrişê çêdarî bo ser xwepîşanderên sivila, girtina bi dehan xebatkarên Partiya Civaka Demokratîk (DTP), hewlên ji bo bêdengkirina kanalên ragehandina Kurdî, daxwaz ji dewleta Îspaniya ji bo radestkirina siyasatvan Remzî Kartal, ku di hemû jiyana xwe de ji çekan û şer bi dûr bûye û bi dehan kiryarên dijî demokratîk yê din ên dewleta Tirk, rê nadin ku kes baweriyê bi gotina serokkomar bike. Turkiye endama Rêxistina Neteweyên Yekgirtî (UN), Konseya Ewropa, Rêxistina Asayiş û Hekariya Ewropa (OSSE), Peymana Atlantîka Bakûr (NATO) û gellek rêxistinên navneteweyî yê din e ku xwe weke parêzvanên mafê mirovan didin nasandin. Ev her weha berendama endamêtiya Yekîtiya Ewropa ye û pîrr micid dixebite heta bibe endama rêxistinê. Turkiyê her weha Konvansiyona Navneteweyî a Mafên Abûrî, Civakî û

Kurtûrî, û Konvansiyona Navneteweyî ya Mafên Sivil û Siyasî îmza kiriyê, lê xwe ji îmkazkirina wê beşa Konvansiyonê ku basa mafê kêmayetiyên dike, anî xala 27'ê parastiyê. Turkiyê her weha Konvansiyona Ewropayî ya Mafê Mirovan pejirandiyê, lê Çarçoveya Konvansiyona Ewropayî ya Parastina Mafê Kêmayetiyên ne pejirandiyê.

Dem a mijar vedigere ser rewşa mafê mirovan li herêmên Bakûrê Kurdistanê û bi giştî mafê gelê Kurd li hemû deverên Turkiyê, xuyaye ku ne ev konvansiyon tene derbarê mafê mirovan de. Di piratîkê de, Kurd û welatê wan ne weke xweyî tene temaşekirin û ne jî mafê hindê hene xwe biyanî bihesibînin û weke biyaniyan xwedî maf bin.

Her çend Dadgeha Mafê Mirovan ya Ewropa bi caran Turkiye ji ber bînpêkirina mafê takên Kurd tawanbar kiriyê û ev welat neçar kiriyê ku xusara mexdûrên Kurd bide, lê di piratîkê de heya niha tiştêkî nekariyê rewşê biguhere. Bi kiryar mijarên demokrasîyê û mafê mirovan, ketine bin siya siyaseta ewlekariya dewlet û artêşê ku her kes û her aliyê "bi Tirbûna xwe şanaziyê neke" ji xwe re weke dijmin dihesibînin. Di encama wê têgehê de artêşê desthilatek xurt standiyê, bi awayekê ku bi zora çekan û di jêr navê "şerê li hember cudaxwaziyê" de, çiya dixwaze li Kurdistanê encam dide. Ev têgeh tu cudahiye naxe navbera şerê çêdarî û daxwaziyên siyasî yê gelê Kurd li Turkiyê. Têgehê wisa li ser dewlet û desthilatê, ku ji aliyê artêşê û siyasatvanên Turkiyê ve birêve diçe, rê nade heya bîngeha layîk an sekûler ya yasayên Turkiyê bikeve xizmeta demokrasîyê û mafê wekhev yê mirovan. Rast berevajî, bi hêceta parastina siyaseta layîk a dewletê, daxwaziyên siyasî û kultûrî yê xelkê û heta rêxistinên çep jî tene serkutkirin. Ev piratîka dewletê weke durûtiya siyasî a Turkiyê tê dîtin. Lê diyare ew dîtin ji wê siyaseta dewletê re tê ku li ser bîngeha yekîneyek unîter bi "yek gel, yek dewlet, yek ziman û yek al" hatiye avakirin. Li Bakûrê Kurdistanê, artêşê û hêzên ewlekariyê desthilatdarê sereke ne. Ji bilî artêş, Mît, polis û candarme, bi salan e dewletê leşkerên çaşan jî ava kiriyê ku bi navê parêzvanên gundan kar dikin, û xelk ji wan re dibêje cerdevan. Di wan salên dawî de, ewan cerdevanan cinayetên herî nemirovane li dijî xelkê bêberavan an sivil encam dane, lê tu car jî ber encama karê xwe hesab nedane. Ji kuştin û destdirêjiyê re bigre heya dizî û şeladina xelkê, tu

qebahet nemaye ku ew leşkerê cerdevan nekin. Hêrişê roja 5'ê Gulanê li gundê Bîlge ya girêdayî navçeya Şernex li Mêrdînê mînaka herî hov ya wan karan bû.

Lîsteya kiryarên bi wî rengî hin dirêj e ku dema meriv wê rêz bike, dê bi serê xwe bibe mijarek cuda. û beşek zêde ji wan karên derveyî exlaq û mirovatiyê li dema desthilatdariya Gül û partiya wî, AKP'ê birêve çûne. Ji wê jî hê xirabtir ew e ku piraniya çaşên îro li Bakûrê Kurdistanê di xizmeta siyaseta dewletê ya dijî Kurd de ne, alîgir an girêdayê AKP'ê ne.

Di hemû dîroka hevdem a Turkiyê de axaftina li ser pirsê Kurd û rewşa herêmên Kurd lê dijîn bive bûye. Tilisma niqaşa li ser rewşa gelê Kurd, rewşenbîr û nivîskarê mirovhez, Îsmail Bêşikçi şikand, dema ku wî di teza xwe ya duktorayê de, li astek akademîk, behsa hebûna rastiya Kurd kir. Lê ciyê wî yê herî ewle girtîgeh bû. Li pey wî re, kêm û zêde hinek rewşenbîrên Tirk mijara Kurd anîne rojevê, lê ne ewan û ne jî Kurdên ku ji kurdbûna xwe xwedî derdiketin tu xweşî ji xwe û wê helwêsta xwe nedîtin. Lê di encama berxwedana gelê Kurd de û bi xwêdan û xebata têkoşerên Kurd, ji sala 1991 û pêve, êdî pirsê Kurd kete rojê siyasî ya Turkiyê. Digel hindê ku qedexeya li ser niqaşên li ser pirsê Kurd nehate rakirin, lê êdî kontrola mijarê ji dest dewletê derket û dîwarê înkârê herifî. Daxuyaniyên serokkomarê demê yê Turkiyê, Turgut Özal, di sala 1992 de ku "rastiya hebûna Kurd" pejirand, mijar xiste rewşek nû. Her çend wê helwestê, di piratîkê de, tu derfetên nû an legal ji bo ku pirsê Kurd bi rîya siyasî were çareserkirin, neanîne pêş. Giring ew e ku ji wê demê ve gelê Kurd, bi xwe û bi hêza xwe, pêngav bi pêngav siyasatvanên Turkiyê neçar kir ku rastiya hebûna wê bipejirîne. Ji ber ku êdî têkoşîna gelê Kurd gihîştê astek weha bilind ku siyasatvanên Tirk nikarin li hember daxwaziyên kurdan bi tevahî bêdeng bimînin. Sala 2005'an, di serlêdana xwe ya bajarê Amedê de, serokwezîr Recep Tayîb Erdogan basî "şaşitiya dîroki ya karbidestan li hember kurdên welat" kir û niha jî serokkomar Gül basî hebûna pirsgirêkekê dike ku nav jê çi be, her pirsê Kurd e. Lê diyare mewdaya navbera gotin û kirinê pîrr ji hev dûr e û rîya wê pîrr bi ji asteng e. Lewma Gül, Erdogan an siyasatvanên din ên Tirk ji gotinê bi der tiştêkê jî bo çareserkirina pirsê Kurd nakin. Belê gelê Kurd êdî ji wê qonaxê derbas bûye ku tenê baweriyê bi gotinan bike.

Mêrxasî û Berxwedana şerê sê roje li gundê Ceterê

“Gelî Hevalan ! Eger Hûn Çûn, Min Cî Nehêlin!”

Beşa 8



Silêman Keleşî

Gelî xwendevanên hêja! her çawa di beşa heftan de ketê berbas, piştî zor û zehmetiyeke zaf, me karî xêncî birîndarekê ku

paşan dê basa wî bê kirin, me hemû birîndarên xwe gihîjandin ciyê diyarkirî.

Berî ku ez herme ser basa eslî, tiştêkî din ku gellek bo min û renga bo xwendevanên jî balkêş be û hewce dizanim bas jê bikim, ewa ye ku di wê gerrê de çend hesp û hêstir bona hilgirtina bar û teqemeniya zêde digel me bûn. Her wisa yek ji wan hêstiran, hêstireke sipî bû ku taybet bû bo hilgirtina bêsîma rakal. Her komîte û hêzekê yek bêsîma rakal hebû ku bi rêya wê ve peywendî digel navenda hizbê dihate girtin. Hêstirek ku barê wê hemû min û teqemenî û silah bû, piştî vekîşiyana hêzên Pêşmerge di gundê Ceterê de, ew heywan bi serê xwe dikeve pey dewa û şûnpêyê Pêşmergan û bi barê xwe ve tê ber derê wê malê di gundê Sakan de ku cara pêşîn heval lê mêvan bûne. Ew heywana xwedî hez nexwast di wê roja teng û nexweş de jî xwedîyê xwe tenê bihêle. Belkî bi hatina xwe û barê ser piştî xwe, heval keyfxweş kirin. Wê heywana bê zar û ziman, bi hatina xwe wefadarî û emegnasiya xwe nişanî Pêşmergan da û nexwest xwe û barê xwe teslîmî neyarên wan bike.

Wê şevê em rê ketin û piştî çend demjimêran digel hemû astengiyên ku hebûn me tevî birîndaran xwe gehande wî ciyê ku mexseda me bû. Sed car avadan be ew cî û warê ku em gehîştinê. Heta cî hebû Kadro û Pêşmerge di nava gowê û mala xwedîyê wê cî bicî bûn. Diyare pêş hemû tiştêkî ciyê baş û rihet bo birîndaran bû, gellek birîndar jî neçar bûn ku digel Pêşmergan di nava gowê de bimînin. Ji ber vê hindê derê hewa pirr sar bû û her kesê/a hez dikir here jorde. Ewa jî bo Pêşmergan girîng nebû ku ewa gowe ye û ciyê pez, ya girîng ewa bû ku piştî sê roj û sê şevan şer û berxwedanê bikarin çend demjimêrekan razên û bêhna xwe vedin. Ew keçên ku ciyê wan di jor de hebû, çûne jorê û yê dinê jî li ser giya û lodan xwe dirêj kirin û razan. Kek Cefer Hamidî du wêneyên wê rojê di gowan de bo min şandine û ezê wan ser malperên internetî biweşînim, heta hemû xwendevanên hêja bibînin. Sipas ji bo kek Cefer Hamidî.

Hevalan karî kêr û zaf wê rojê bêhna xwe vedin. Xwedîyê malan wek Kurdên welatparêz û mêvanhez çend pez (kavir) bo me şerjê kirin û birîndar û Pêşmergan xwarineke xweş û baş xwarin û dil û hinavê wan germ bûn. Birîndar jî bi gorî îmkatên ku hebûn, di gowan de hatin dermankirin. Wê rojê dîsan ez û Kek Mecîd Nûrî bal hev ser lodê raza bûn. Dema ku ez razayî bûm, şerê nava gundê Ceterê di xewna min de

derbaz dibû. Westê ez ji xew rabûm û min gote kek Mecîd şer û tirs dihu bû, lêbelê ew dîmenê wê tîne ber çavê min, ez niha ditirsim, wî jî got hûn duh bibûne xweşmêr û îro jî ditirsin.

Piştî nanxwarin û bêhnvedanê, me bi hevala re bas dikir, eger hatiba dîtin û nêrîna wan hevalên din ser girtiba û em çûbana çiyayê Şêxbazîd, rewşa me û birîndaran dê çawa ba. Ewan jî digot Xwedê kir ku em neçûn, eger em çûban, rewşa me dê gellek xirab biba, nemze ya birîndaran.

Çi xebatkar û Pêşmergeyêkî Kurdistanê nikare basa fidakarî û berxwedana xwe yan hêza Pêşmerge bike, lê basa fidakarî û rola xelkê qehreman yê Kurdistanê neke. Eger piştgirî û alîkariya gel neba, Kadr û Pêşmergan nedikarin wan hemû hemasan biafirînin. Ewa 24 sal bi ser wê bûyerê re derbaz dibe, ez bi qasî van 24 salan sipas û qedirzaniya xwe pêşkêşî hemû xelkê herêmê bi giştî û bo wan kes û malbatan dikim ku pez û kavir di wan rojên teng de bo Pêşmergan serjê kirin û can û malê xwe dêxistne xeterê. Her wisa sed silav û her bijîn bo wan qehremanên nadiyar û malbatên hêja û birûmet ku rojan birîndarên me di himbêza xwe de xwedî kirin û bi hezar zehmetiyan derman bo wan anîn û li dijîmin parastin.

Gelî xwendevanên delal! her wek hate baskirin, di şer û berxwedana sê roj û sê şevan de zêdetirî 400 kuştî û sedan birîndarên dijîmin hebû ku di dema xwe de ji Radyo Dengê Kurdistanê Îranê hatine xwandin. Ew şer bi şerê sê rojî li devera “şimala” Kurdistanê (Ceterê) bi nav û deng e. Şerê sê roje piştî 24 salan niha jî li ser zarê xelkê û di axavtin û stiranên xelkê herêmê de hertim tê gotin û dê her bête gotin jî.

Her wisa di wan şer û berxwedanan de, 13 şehîd û 38 Kadr û Pêşmergên PDKÎ jî birîndar bûn. Ez dixwazim tenê çarenivîsa birîndarekî şerê Ceterê bedelî hemû birîndaran xwe nimûne binivîsim. Ji ber ku her birîndarekî Pêşmerge bi xwe dastanek heye ku nivîsîna hemûyan pirr zehmet û giran e. Ez gellek hêviya hevalên qelem bi dest rawestam ku ser wê bûyerê binivîsin. Lê mixabin min dît ku piştî 24 salan kes naniwîse. Min jî gellek pê heyf bû ku tiştêk ser nehê nivîsîn. Bi hizra min her niha 100 kes ji wan Kadr û Pêşmergên ku di nava şerê Ceterê de bûne, sax in û li Îran û derveyî Îranê dimînin. Hêvîdarim ku ew hevalên bi dest û qelem eger kêmasiyên vê nivîsarê hebin ku bêşik hene, serast û dewlemend bikin.

Xwendevanên hêja! ya rastî hewce bû navê gellek kesên din jî di wê rêze gotarê de hatiba anîn ku kedeke zêdetir dabûn, lê renga navê gellekan bîra min nemabin û anîna navê hindekan jî min ji ber barê emniyetî (ewlekarî) ku niha li herêmê ne bi baş nezani, ji ber vê hindê, ez bi anîna

kêmtirîn navê kesên sax razî bûm. Lê heta ciyê destê min hat û karî, min navê şehîdan nivîsî, çî yê di wî şerî de şehîd bûn, çî jî piştî wan şeran şehîd bûn, lêbelê girêdana wan bi wî şer ve hebîn. Ji ber ku ew êdî nemane ku bikarin basa qehremanetiya xwe û hevalên xwe bikin. Heq wisa ye ku em rol û fidakariya wan bo gel binivîsin û bidne nasandin.

Evên jêr jî navê Şehîdên PDKÎ di berxwedan û şanaziya şerê gundê Ceterê de ne:

1. **Idris Mîrî** xelkê gundê Rêkavê, 2. **Kamilê Reşo** Kadroyê PSK'ê - Kurdistanê Bakur 3. **Serbaz Ebdilî** xelkê gundê Kurana Evraz, 4. **Tofîq Bawanî** xelkê Bawanê, 5. **Mizefer Kamranî** xelkê Axçeqel, 6. **Silêman Reşîdî**, 7. **Seîd Mendan** Hêza Şehîd Niho, 8. **Firoz Omerî** xelkê gundê Axçeqel, 9. **Mewlûd Ebdullahî** xelkê gundê Golegeniyê, 10. **Heyder Ehmedî**, 11. **Mehmûd Kirêve** Serdesteyê desta zerbet ya hêza Aware ya Pîranşarê, 12. **Mihemed Bayezîdî** ji Hêza Aware, 13. **Ebubekir** ji Hêza Aware ya Pîranşarê, 14. **Kesekî sivil** yê xelkê gundê Ceterê.

Her çawa berê min soz da ku basa serpêhatîya birîndarekî şerê Ceterê bo we xwendevanên bikim, ew jî kekê **Silhedîn Mihîzade** ye, ku bi **Silho** tê naskirin. Kek Silhedîn yek ji wan 38 birî darên şerê Ceterê ye. Her yek ji wan bi xwe dastanekî dîr û dirêj heye ku nivîsîna hemûyan di rêzegotareke wiha de eger nemumkun jî nebe, pirr zehmet e. Lê min wisa baş zanî ku tenê basa hevalekî birîndar bikim ku hemû xwendevan baş ji derd û kovanên Pêşmergên birîndar bizanin. Her wisa haydarê asteng û zehmetiyên wê demê a xebata gel û partiya xwe bin. Eger kesek yan jî kesaneke nemaze nifşa nû ku jiyan û berxwedana Pêşmerge wek dastan çav lêkirine ya jî lê dikin, ez dixwazim wan bibim nava kûratî û rastiyan ku egîd û mêrxasên demokrat di jiyana pêşmergeyîya xwe de pê re rûbirû bûne. Heta hemû kes ji kar, rol û zehmetiyên wan agahdar bin. Bila gelê Kurd û PDKÎ û hemû dayik û babên wan birûmet û şanaziye bi wan xort û lawên xwe bikin û her tim û tim bi wan serbilind bin. Bila heta hemû dastan û çîrokên xeyalî jî serê kornuşê ji bo wan hemû mêrxasî û berxwedanan bitewînin...

Dûmahîk heye...



Mafê Mirovan

Nivîsîn: Peter R. Baehr
Wergeran: Mecîd Heqî



Rola Mafê Mirovan Di Siyaseta Dereve De

Bingeha Rojavayî

Çawa mirov dikare hizra cîhanîbûna mafên mirovan wek di Carnameya Cîhanî ya Mafên Mirovan de hatiye bibîne? Hinek gumanê ji wê yekê dikin ku hizra parastina mafên bingehîn ên mirov berê li welatên rojava

hatibe ser ziman û nivîsandin. Ya rast ewa ye ku bingeha wê yekê wek hizra Marksîzmê ji felsefe û çawaniya hizirkirina rojavayê çavkanî digire. Pirsra bingehîn ewa ye ku ew mafane li gor hewcehiya demê hatibin geşekirin û bibin normên cîhanî li kirdarên mirovan û li seranserê cîhanê ji aliyê mirovaniyê ve digel cudahiyan çandî yên wan bê qebûlkirin.

Wîsta parastina mafê takekes yek ji kevneşopiyên herî baş yên rojavayî ye ku li gor wê mafê bingehîn yê mirov e ku nabe bi tu awayekê ji aliyê takekes, girûp û alî û desthilatan ve bîn pêşekirin.

Ewa cudahiyeke bingehîn ya navbera welatên rojavayî digel welatên din e. "Donnelly" hizirkirina ji mafê takekes yek ji cudahiyan herî mezin di navbera rojavaya modern û welatên ne-rojavayî di warê rêzgirtin li hurmeta mirovî de dizane.

Ewa nahê wê wateyê ku di serdema modern de normên cîhanî nikaribin bîn geşe û xurtkirin. Ewa aliyê kêrî demê xeyala wê yekê mumkin dike ku pêvajoya mafên mirovan, ku bingeha wê li rojava bû, ji aliyê civakên ne-rojavayî hatiye pesendkirin yan bê pesendkirin. Ya giring ewa ye ku herçend hizra parastina mafên takekes ji aliyê rojava ve hatiye holê, ewa li dijî wan hizr û ramanane nine ên ku di cîhên din de hatine geşekirin û bûne norm û standardên cîhanî.

Nîşaneyên gellek hene li ser mijara serê hatiye baskirin, ku bi kêmanî ji aliyê dewletan û êlîtan ramyarî ve yê bûne diyardeyên cîhanî. Nêzikî hemû dewletan çanda siyasî û civakî ya wan çawa bibe bila bibe, bînpêkirina sistematîk ya mafên mirovan wek jênosayd, îşkence û windakirina bi zor şermazar dikin. Dewletên cîhanî bi kêrî wê qebûl dikin ku standardên cîhanî yên mafên mirovan diviya li welatên wan jî bîn çibîckirin. Ewana her wisa ji bo rejîmên tundrew ên weke Komara Îslamî ya Îranê jî rast e.

Nûnerên Îranê dema nîqaşa peymanî û çibîckirina peymanên mafên mirovan digel wan tê kirin, dibêjin ku ew diviya di navbera peymanên navnetewî û destûrên Quranê de yekê hilbijêrin.

Ew destûrên Quranê tercîh dikin. Lê bi kiryar Îranê li hember komîsyona mafê mirovan a Neteweyên Yekgirtî xwe davêje ber deriyê peymanên navnetewî yên mafên mirovan. Fermana kuştina Selman Rûşdî nivîskarê pirtûka **Ayetên Şeytanî** ji aliyê rêberê mirî yê Îranê Ayetullah Xomeynî wê yekê derdixe holê ku peyvên dawî bo pirsra mafê mirovan hîn nehatine nîqaşkirin û fehmkirin.

Dûma Nûçeya rûpela 1'ê

Di axavtina xwe ya bajarê Seqizê de, wî basa vê yekê kir ku Amerîka û dijminên Komara Îslamî li derveyî sînoran alîkariya hêzên Kurdî dikin ku dijberiya rejîma wî bikin, di halekê de ku çavkaniya eslî û sereke a xebata azadîxwaziya Kurdan, neteweya kurd e.

Bi hatina wî tu yek ji pirsgrêkên xelkê nehatin çareserkirin û wî hemû pirsêk xelkê Kurdistanê girêdayî pirsên Olî zanî û herî zêde bal kişande ser mijar û pirsên di vê derbarê de.

Beşek zaf ji xelkê gund û herêmên ser sînorên parêzgeha Kudistanê kasibkariyê dikin, lê wî di axavtina xwe ya bajarê Merîwanê gaf ji xelkê xwar ku wî karî nekin, di halekê de tu proje û pilanek ji bo wî xelkê xizan û belengaz yê Kurd pêkêş nekir.

Serdana Xamineyî weke rêberê olî yê rejîma Îslamî a Îranê bo cara yekemîn û ew jî bo dema 8 rojan zêdetir manoreh siyasî û ewlekarî bû.

Şiroveya
Peyvên Siyasî

Berhevkar:
Omid Esxeran
omid_anbi@yahoo.com



Sipîtik (Sceptic)

Têgiha Sipîtik yan Felsefeya Guman, yek ji kevintirîn mektebên felsefî yên Yûnana

Kevin tê hesabandin û di bîr û bawerên Olî de bi kesekê re tê gotin ku baweriya wî/ê bi ol tu nebe yan guman tê de hebe. Lê di Yûnana kevnar de ku têgiha han li wir derketiye holê, Siptîk bi kesekê dihat gotin ku bi baweriya wî/ê, mirov bona bîdestxistina zanistê terazû û pîvaneke diyarîkirî tunîne û bi tu awayekê nikare rastiyan peyda bike. Ji ber vê jî alîgirên wê derheq hemû tiştêkê diketin şik û gumanê û digotin ku hesta mirovan tûşî nerastiye tê û eqlê mirovan jî nikare nerastiyan han çareser bike, bi vê sedemê jî em nikarin derheq tu tiştêkê bi dilgermî û piştrastiye ve nêrîna xwe derxin holê û bi rast bihesibînin. Ji wê jî girîngtir ev e ku surûşt, ruhiyat, zewq, têgihîştin, perwerde û hînkariya mirovan newekhev e û bêguman eva jî dibe sedemê vê yekê ku dadwerî û pêşbînî wek hev nebin. Bi vî awayî her cure zanistek di civakê de cihê şik û gumanê ye. Ji aliyê din ve alîgirên Sipîtikê li ser wê baweriyê bûn ku têgihîştin li her tiştêkê bêy ezmûna wê tiştê ne mumkin e. Gumankeran digot ku mirova zana divêt bîniyaz be û di hember hemû warên jiyane de liserxwe be. Her wek me îşare pê kir, Sipîtik yan Felsefeya Gumanê yek ji kevintirîn xwendingehên felsefî yên Yûnana kevnar tê hesabandin û piştê diçe nav mekteba "Sitayîkîzm" û "Êpîkoriyanîzm"ê û di serdemê "Rênesans"ê de jî dîsan ji dayîk dibe û di vê serdemê de bi kesekê re dihat gotin ku di Ola Kirîstiyaniyê de şik û guman dikirin û ew ol red dikirin. Ji ber vê yekê jî têgiha guman û gumankeriye weke "Kufr" û "Kafir" dihesibandin. Îro jî kesek ku guman di tiştêk yan mijarekê de hebe, bi "Sceptic" tê naskirin.

Çavkanî: (Ferhengî Ramiyarî

Nîga) Azad Weledbegî

(Danêşnamêyê Siyasî) "Political Dictionary"

Daryûş Aşorî

Diyardeya Firotna Keçên Îranî Di Welatên Erebi De

Agirî – Beşa Civakî

Carek din raporek derheq firotna keçên Îranî di welatên Erebi de, di yek ji malperên hundirê Îranê de hate weşandin.

Malpera "hammihan"ê, di raporekê de derheq diyardeya han dinivîse: Temenê piraniya ew keçên ku ji bo Dobey û bajarên din yê Mîrîtiyên Yekgirtî ên Erebi bi qaçaxî tîn şandin, di temenê 10 heya 17 saliyê de ne.

Serokê Deftera Polîsa Navnetewî "Interpol"ê li Îranê, di payîza sala 2006'an de gotibû: Ji îro pêde pişeya qaçaxa keç û jinên ciwan ên Îranî ji bo welatên derdorê, yek ji pişeyên pirr dahat di Îranê de ye.

Navhatî herwiha gotibû ku piştî qewmîna erdheja bajarê Bemê li Îranê, keçên bê serpereşt hatin revandin û ber bi bazarekî naskirî di Tehranê de hatin şandin ku li wir bazirganên Îranî û biyanî bi hev re bazarê dikin.

Bazirganiya han qet bê beşdarî û haydariya Melayên desthilatdar birêve naçe. Berpîrsên dewletî bi xwe di kirîn û firotin û azara zayendî a jin û keçên Îranî de dest hene û beşdar in.

Lê hinek ji nûnerên Meclîsa Şewra Îslamî ya Îranê, weke nûnerê parêzgeha Îsfahanê, diyardeya han bi fenamenek normal dihesibînin û belavkirina nûçeyên han weke piropagandayek li dijî rejîma Îranê dizanin.

Xincî Dobe yê, welatên Efxanistan, Pakistan û Hidûstan jî di refa wan welatan de ne ku bazirganiyê bi keçên Îranî dikin.

Li gor lêkolînên ku hatine encamdan, hejariya aborî û çandî du sedemên sereke ên firotin, qaçax û helatina keç û jinên Îranî û tûşbûna wan bi taximên (bandên) qaçaxçiyên tê hesêb.



Kesên endam di bandên qaçaxa keç û jinan de, bi mifahwergirtina nerewa ji xalên han ên lawaz, ber bi gundên biçûk û bêpar ji hemû îmkanatên pêşkevî û îroyîn diçin (bixasmanî gundên parêzgeha Xorasanê) û tevî malbatên keçan diaxivin û bi dana sozên dêrew û nerast weke "keçên we bi rêya han dikarin serbixwe bin û dê bikaribin bi xwe debara jiyana xwe bikin û herwiha ew dê bikarin di pêşerojek nêzik de pêwîstiyên we jî (malbata keçan) dabîn bikin", malbatên wan dixapînin û keçên wan ji wan dikirin.

Li gor qisên wan kêçên ku hatine firotin û bûne goriyê kiryarên han ên kirêt, qaçaxçî ji bo kirîn her keçekê 6 heya 7 milyon tûmenan didin malbatên keçan. Helbet biha û nirxa keçên biçûk, anku yê di navbera temenê 10 heya 12 saliyê de zêdetir e û bi 20 milyon tûmenan tîn kirîn û ji bo şêxên Emaratê tîn şandin.

Çimku şêxên Erebi pitir hez ji keçên biçûk û kêmtîr dikin!!

Karnasekî civakî derheq sedemên

firotna jin û keçan di parêzgehên Xorasan, Sîstan û Belûçistan Îranê, û welatên Efxanistan û Pakistanê de dibêje: Taximên qaçaxçî pitir wan keç û jinan destnîşan dikin ku di malbatek hejar û destkurt de dijîn û rewşa wan a aborî pirr xirab e.

Piraniya ew keçên ku ji bo Mîrîtiyên Yekgirtî ên Erebi tîn şandin, bi du rêyan tîn veguhastin, hejmarek ji wan jin û keçan bi terzek fermî ji malbatên wan tîn xwastin û bi dana hinek pere bi bavê wan ji bo derveyî welat tîn şandin û hejmarek ji keçên din jî hene ku tîn revandin yan ji aliyê endamên banda qaçaxa jinan tîn xapandin û bê haydariya malbatên wan ji bo derveyî welat tîn birin. Ger mîrên Erebi wan keçan weke jina xwe hilibijêrin û wan bixwazin, pirsgirêk kêmtir e, lê pîrsa sereke demekê derdikeve holê ku keçên Îranî ji aliyê mîrên Ereban ve bi havserî nahên qebûlkirin û bi dilê wan nînin. Lewra ev keçane neçar dibin bona xwedîkirina xwe, laşê xwe bifiroşin û tûşî karên dûr ji exlaqê bibin.

Ên Ku Madeyên Sirker Di Nava Girtîgeha Urmîyê De Belav Dikin, Kî Ne?

Agirî – Beşa Civakî

▶ Rojane yek kilo madeyên sirker weke Kirak û hiroyîn, wd..., ji aliyê 1300 heya 1800 kes ji girtiyên tûşbûyî bi madeyên bêhişker di zîndana bajarê Urmîyê de tî bikaranîn.

Bihaya her yek girem ji madeyên hişker weke Kirak û hiroyînê di navbera 6000 heya 10000 tûmenan e.

Lewra rojane 6 heya 10 milyon tûmen pere bona kirîn û firotina madeyên sirker di wê girtîgeha kurdîsianê de tî xerckirin.

Di rastî de gumanbarên sereke ên ku madeyên hişker di nava wê zîndanê de belav dikin, ew kesên girtî ne yê ku ji merexesiyê vedigerin. Çawaniya birina madeyên sirker bo nava girtîgeha bajarê Urmîyê çihê pirsîyarê ye!?

Ew rêya ku bo nava zîndanê diçe, deriyêke mezin e ku panahiya wê 3 metr dibe û di dema hatin û çûna girtiyên de bi qasî niv metrê tî vekirin û daxistina. Efser û Nobedarên vî beşê hêzek bi ezmûn û lêzan û dewredîtî ne ku gişt liv û tevgerên xelkê dixin jêr çavdêriyê.

Kesên girtî rojane 3 caran li derveyî girtîgehê xwarinê werdigirin. Bi hûrî û bi dezgehên pêşkevî lêgerîna xwarinên han tî kirin.

Heta memûrên zîndanê, berpîrsên tendurustiyê, karmendên beşa civakî, berpîrsên "Enderzgehan", mele û birêveberên navxweyî bi dest û dezgehên elektronîkî lêgerîna wan xwarinan dikin.

Heta bi nobedarên vî beşê hatiye ragihandin ku ger şik bi her yek ji hevkarên xwe jî kirin, li wan jî bigerin. Xincî vane rojane hatin û çûnek zaf bo zîndanê tî

kirin, ji vana şandana 20 heya 25 kesan bo merexesiyê û vegeftina girtiyên çûyî bo merexesiyê.

Herwiha rojane 10 heya 15 girtiyên nû tînin bo zîndanê ku egera anîna madeyên sirker ji aliyê van ve pirr zehmet e.

Lewra kesên herî sereke ku madeyên hişber tînin bo zîndanê, girtiyên vegeftiyayî ji merexesiyê ne.


Zîndaniyanên han rojane bi qasî 40 heya 50 girem hirovîyan yan kirakê tevî xwe tînin bo zîndanê ku encamdana kiryareke han bê hevkarîya berpîrs û nobedarên zîndanê û hebûna pirogiramek rêk û pêk û ji pêşde darîti nahê encamdan.

Divêt berpîrsên lêgerîna û girtîgehê bersiva vê pîrsiyarê bidin ku ger hemû

girtiyek madeyên hişber bi xwe re tînin, çawaye ku bi rehetî ji binkeya lêgerîna navxweyî re derbaz dibin, ew jî bi hebûna wan hamû îmkatên pêşkevî?

Veguhestina medeyên hişber bo benda Niswan û ji bo benda navxweyî a girtîgeha Urmîyê di gumgume û devlikên tîrşî û wd.... de heya çî qasî rast e?

Bêşik yek ji armancên rejîma Komara Îslamî a Îranê tûşkirina xelkê Îranê bi madeyên sirker e û rejîma Îranê ji rêyên nerasterast ve di vê derheqê de hemû hewlên xwe dide. Niha pitir ji çend milyon kes li Îranê tûşî madeyên sirker bûne. Ev yeka jî rûmetê civaka me gellek nehez û kirêt kiriye.



Serxweşiya Deftera Siyasî ya PDKÎ, bi hilkevta koça dawî ya Profesor Şilhan, mamosta, heval û hogirê Şehîd Dr. Qasimlo

BILA EM BÎRANÎNA DOSTÊN NETEWEYA XWE BİLIND BÎNÎRXÎNIN

Prof. Dr. Venek Şilhan, navbdartirîn aborînasê Komara Çekê, di 82 saliya xwe de çû ser dilovaniya

xwe. Prof. V. Şilhan Kurd ji Şehîd Dr. Ebdulrehman. Qasimlo di salên 50'ê sedsala bihurî nas kiribû. Di destpêkê de Dr. Qasimlo şagirtê wî bû, lê di dawî de bibû dost, heval û hogirê wî.

Prof. V. Şilhan di sala 1927'an de hat dinê. Bavê wî şervanê Komara Çekê bû. Bo sazkirina Komara Çek salan Çek li dest de şer kiribû.

Di sala 1938'an de ku Çekoslovakya ji aliyê Hîtler ve hat dagirkirin û Almanî bû zimanê fermî, bavê V. Şilhan zarokên xwe ji dibistanê kişand û nehişt ku îdf herin xwendin bi zimanê Almanî. Ji ber ku neçû dibistana Almanî, rejîma Hîtler ew wekî zarok boa kar şand fabrika hesin. Heta dawiya şer di wê fabrika hesinê de wek karker kar kir.

Piştî şerê cihanê yê duyemîn V. Şilhan bêtî ku dibistan xilas kiribe, dest bi zanîngehê, şaxa aboriyê kir. Di eynî salê de bû endamê Pariya Komunîst a Çekoslovakya (1945).

Sala 1950'an, zanîngeh xilas kir û çû Leningrade – Yekîtiya Sovyetê- û bû doktorê aboriyê û dest bi xebata xwe ye zanistî di warê aboriyê de kir û di demekî kurt de bû Profesore Aboriyê di baştirîn zanîngeha aboriyê di Ewropa Navîn de.

Di vê navberê de tu car dest bi xebata xwe ya siyasî ber nedabû û bûbû endamê lîjna navendî ya Partiya Komunîst ya Çekoslovakayê. Di sala 1967'an de, pêwîstiyên reformên aborî di nav rejîma Komunîst de weşand û bal kişand ku bê van reformên bingehîn komunîzm nikare xwe didomîne. Şilhan bû dengê reformîstan di welatên Komunîst de. Daxwazên wî yê reform di sistema Komunîzmê de xwe wek **Bihara Pragê** di sala 1968'an de da pêş.

Yekîtiya Sovyetê û welatên Komunîst ên Ewropî biryar standin ku Bihara Prag bi leşker û Çekan bidin sekinandin. Sed hazaran leşkerên welatên Komunîst yê Ewropayê ketin Çekoslovakya û dest bi girtin û zîndanîkirina reformîst û azadîxwazan kirin, di nava girtiyên de hemû lîjna navendî ya Partiya Komunîst ya Çekoslovakya jî hebûn, ji bilî V. Şilhan !

V. Şilhan di bin dagirkirinê de car din Partiya Komunîst a Çekoslovakayê bi dizî ve civand. Di vê civînê de wek Sekreterê Giştî yê Partiya Komunîst ya Çekoslovakya hat hilbijartin. Wek Sekreterê Giştî yê Partiya Gelê Çekoslovakya li hember



Ji aliyê çepê ve: Dr. Yekta Uzunoglu û Prof. Dr. Venek Şilhan

leşkerên dagirker dest bi tekoşîna azadiyê kir. Piştî demekê hate girtin û Bihara Pragê bi loza leşker, top û tanqan bi dawî hat.

Prof. Şilhan di sala 1991'an de fabrika "bijuteriyê" û "kiristale" ji dewletê stand û bû serokê wan. Hemû parên şirketê di nav xebatkarên vî fabrikayê de belav kir û ew kirin şirkên fabrikayê.

Di Komara Çek de fabrikayê û şirketên ku herî serkevî ye, ew fabrika ye ku navê wê "Precioza" ye û di çendîn welatên din de

şaxên wê hene. Bi vê mînakê Prof. Şilhan xwest bide zanîn ku aboriya Sosyalîst a reformkirî mimkin e û baştir e bo serkevtin di warê aboriyê de di xizmeta mirovatiyê de be. Prof. V. Şilhan di sala 1990 – piştî şoreşa qedîfê – bû rektorê zanîngeha Aboriya Komara Çekoslovakya. Wek aborînas li dijî aboriya Kapitalîzmê û xeletiyên gavên ber bi kapitalîzmê derket. Ew heta dawî jî sistema aboriya sosyalîst diparast û pê bawer bû.

V. Şilhan nehiştin ku carkî din vegere li ser xebata xwe di warê aboriyê de. Di sala 1977'an de bû yek ji serokên muxalefetê hember rejîma Sovyeta berê. Ta sala 1989'an – 21 sal- wek karker kar kir .

Mayîna wî ya di bajarê Pragê de qedexê bû, çû di nav zinarekî de bi destên xwe şikeftê çê kir û di nav wê şikeftê de dima. Di nav wê şikeftê de wî di sala 1988'an de şehîd Dr. Ebdulrehman. Qasimlo ziyaret kiribû. Prof. Şilhan û Dr. Qasimlo dizanibûn ku dê dawiya rejîma Sovyetê, bi hev re li ser guhartinên di nav rejîma Komunîst de şewirîbûn û Şilhan jê re soz dabû ku piştî guhartinan dê di şerê azadiya gelê Kurd de alîkariya Dr. Qasimlo bikin.

Dawiya sala 1989'an, dawiya rejîma Komunîst li Komara Çekoslovakayê bû, lê heyf ku Dr. Qasimlo serkevtina heval, hogir û mamosteyê xwe nedît , ew şehîd bûbû ...

Prof. V. Şilhan, dostê gelê Kurd yê qedîmî çû ser dilovaniya xwe, bê ku Kurdistanê -ku tim di dilê wî de bû- bibîn.

Deftera Siyasî ya PDKÎ, bi rêz û hurmt ve, wî xebatkarê rêya azadî û dostê Kurd bibîr tîne û bi vê hencetê ve behî û sersaxiyê ji malbata wî û dostên Profesor Şilhan dike.

Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê
Deftera Siyasî
18.05.2009
28.02.1388

ZANIST

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com



Zanist, her gav bi zanyariya rêzikên camidî (tiştêyî) û her wisa bi azîne û kardariyên civakî re bidest dikeve. Mebesta hemû şaxên zanistê, gihîştina zanyariya rêzikên bingehîn an jî bidestxistina hîmê rastiya giştî ye.

Zanist, bi dîroka mirovahiyê re tûşî gelek guhertinên domandar bûye. Belê îro ro li gora demê û pêşveçûna teknolojiyê dirûvekî nû girtiye.

Dîroka zanistê bi qandî dîroka mirovahiyê kevn e. Pêkanîna zanistê, berî nûvedaniya (îcada) nivîsê ye. Hem ji wêneyên berqef û şikeftan, hem jî ji xêzikên birêkûpêk ên ser hestî û qiloçan tê femkirin ku mirovahî, beriya dîrokê jî demsalên salê şopandîye û bi şaxên zanistê nasdar bûye.

Bi pêşveçûna zanistê re, zanista felsefeya xwezayê; û zanista xwezayê jî bi lêhûrbûna egerên şikberî û aqlî re derketiye holê. Berî ku zanist bigihîje heyn û heyama xwe ya kemilî, li gellek deverên dinê yên cihêreng ên din jî aj daye. Ji van zanistên dîrokî yên herî kevn yek jî esmannasî (astronomî) û ya din jî bîrkarî (matematîk) e. Têkiliya esmannasiyê bi matematîkê û bêtir jî bi olên demê re xurt bûye. Stêrnasî li gora zanyariya olî pêk hatiye. Salnameya stêrkan, ji wê demê dest pê kiriye û heta dema olên tekperest an jî tekxwedayî ango dema dîroka nêzîk, dom kiriye. Reveberî û desthilatdariya dūgelên Çînê bixwe jî her car jî zanista esmannasiyê sūd û fêde wergirtiye. Zanista felsefeya xwezayî li rojhilat û rojavayê dinê, bi cihêrengiyeke mezin xwe daye der. Zanista xwezayê li Çînê bi awayekî, li Misrê bi awayekî û li Ewropayê jî bi awayekî din pêk hatiye. Dergûşên şaristaniya rojava yên wekî Misrê û Mezopotamyayê taybetiyên xwe cihê cihê nîşan dane. Ji ber ku li Misrê bawerî li gora pergala gerdûnê ya ku girêdayî berpirsiyariya xwedanên xêrxwaz teşe girtibû, zanist û zanyariya demê jî di vê çarçoveyê de rola xwe ya dîrokî dilîst. Misra kevnar gellekî di bin bandora olê de mabû. Ji bo wê, çawaniya zanistê jî li gora wê baweriyê dirûv digirt. Şaristaniya Mezopotamyayê jî dişibiya ya Çînê. Çawa ku li Mezopotamyayê Ferat û Dicleyê wekî du çemên jiyane dihatin zanîn, li Çînê jî çemên Huang He û Yangtze jî ji bo şênîyên welêt ew qasî girîng, kariger û jiyani dihatin zanîn û pejrirandin. Ew erda bêwêç û qeraç incex bi saya avdana bendavên mezin û çapgir dikaribû ber û deramet bida. Di wê demê de, bager û lehî, kêzik û bihok, nijdevan û talankaran, jiyana dixistin astengiyê.

Bêwewletî û dilbigûmaniya demê raselitînî

ser erdnîgariya adan bûbû. Mirovatî ji bo pêkanîna civakeke bibiryar û pergala avdaniya nûjen û astengkirina karesatên xwezayî, hewcetî bi behredariyên teknolojiyê hebû.

Belê mirovên demê baweriyên derî zanistê diparastin û ji zanistiya erênî bêpar mabûn. Bajarên gewre yên ku li dest û beriyên û li rex û derdorên perestgehan hatibûn avakirin, hemû di rêveberiya rahîban de bûn. Plangêrê pêşnûmayên wekî erx, cihok û pergale avdaniyê; her wiha karê bendavê û suxrevaniya giştî hemû di destê kesên oldar de bû. Esmannasî û matematîk di van mercan de pêşve çû û gihîşt merhaleyeke nû.

Pergala jimareyan li gora 60 hejmarî bû. Îro pergala beşên demjimêrê; saet, xulek (deqîqe), çirke (saniye) û her wiha pile (derece) hê li gora rêpivanên wê pergale ango li gora zanîn û zanyariya Mezopotamyaya kevnar têne bikaranîn. Li gora baweriyên demê, rûyê asîman, wekî cih û wargehên xwedanan bû. Bûyer û qewmînen asîman û xwezayê jî wekî karê xwedanan dihatê dîtin.

Bi vê karvaniyê re zanîna esmannasî û peyre jî ya matematîkê bi geşedaniyeke mezin derketê holê. Piştî peresîna zanista esmannasiyê bi sedan sal, Yewnaniya kevnar jî heman pergale bikar anî; jê sūd wergirt û pêşve bir. Matematîkzanên Babilê, girêdanên Pythagoras baş dizanîn û ew dixebitandin. Heta bi vê hevkeşiyê re amarên (hesabên) selef (rîba) yekbûyî jî diferisandin. Hem Çîniyan û hem jî Mezopotamyayîyan, berî niha bi hezaran sal, bi saya zanyariya demê xweza û asîman bi baldarî raçav kirine û sêwirandine.

Belê tu caran xweza û asîman bi awayekî zanistî rave nekirine û li ser têkiliya xwezayê û mirov hûr û kûr nefikirîne. Zanyarên îroyîn ên Mezopotamyayê û Çînê, bi saya zanyariya hemdem û zanista diyalektîk, hem pêwendîya navbera xwezayê û mirov û hem jî ya civak û dîrokê baş şirove kirine.

Ev jî dide xuyakirin ku her car zanist û zanyarî û her wiha şaristaniya dinê li ser koka xwe aj dide.

Her çend ku zanyariya hemdem û teknolojiya îroyîn li ser bûyerên girgîn û şênber hûr dibe jî dîsa jî xeyalên zanistî, mirov arasteyî afirînerî û afirinendetiyan nû û nûjen dike.

Vladîmîr Nabakov girîngiya vê yekê bi vî awayî tîne zimên: "Zanista bê xeyal û hunera bê rastî nîn e."

Kaniya Helbestan

Xulamên Xulamokan e



Konê Reş

Xulamên xulamokan
Çavnêrî û zêrevaniya
Şopa û şûna te dikin,
Guhdariya pîş û sazê
te dikin..?!
Hewil didin bahoza te ya gur
Rawestînin..
Gelo kevîz dikare deryayê
Bi beden bike ?!
An gelo! Burc ji qûmê têne
Avakirin ?!
Guh li wan neke.. Çendî perperîk
Li dor çirayê kom bibin
Xwe di şewitînin û
Xweş nîşanin
Ji ronahiya çirayê re.* * *
Xemgînî tu ?
Ji ber ku derew û xap
Li te kirine û dikin ?
An bazirganiyê
Bi navê te dikin ?!
Ne xeme, bi vir û xapan
Rojên xwe derbas dikin.
Ji wan werê kes wan nas nakî,
Bîr nabin ku wek rewrewkê ne
Çendî mirov nêzîkî wan bibe
Têne veşartin û
Çendî durrî wan keve
Belû û eşkere dibin.* * *
Carna tu şiyar dibe ku
Xwe di pişt rewrewkê de
Veşartine, Bi kî û zikreşî dane ser şopa te û
Bi bê dengî şerê te dikin.
Hewil didin bi navê te
Bazirganiyê bikin û te biguherînin,
Rêbaza te li ber çavê te
Reş bikin û dawî
Te bikin xulamekî mîna xwe ..
Pêwîste tu bi wan re bikene
Ji ber ku ew koleyên demê ne
Nêzîk, Wê dem demê wan
Yê rast eşkere û belû bike.
Ma te ew gotina pêşiyên sehnekiriye:
(Tu çi toví di xakê de bi reşîne
Tê berê wî toví hilîne). * * *
Bi gurnij e,
Te ew kirine sergêjekeke mezin de
Tu bûye barekî giran
Li ser milên wan,
Di bin giraniya barê te de
Xew li wan diherime û
Ew çend gotinên ku tu dinivîstîne,
Ji wan re bûye kul û xem,
Normal e şerê te bikin..
Bi live, Li paş xwe neztîvire
Ew xulamên xulamokan e.

KEVNEŞOPÎYÊN XERAB Û WEHŞETA CERDEWANAN



Loqman Polat

Wehşeta ku cerdewanan li gundê Mêrdînê pêk anîn, anku kuştina 46 mêr, jin, zarok û sê jinên hemilê, xwîna mirov sar dike,

tûkên porên mirov bîz bîz dikin. Ew wahşet bi gotinan nayê rave kirin. Di dîroka Kurdistanê de wahşetke weha xwînxiwarî nehatiye pêkhatin.

Ev qetlîam bi destê peywirdarên dewletê (cerdevan) ve hatiye pêkanîn. Bi çekên dewletê hatiye kirin û li ber pozê qereqolê çêbûye. Ji îfadeyên mêrkûjn xwînxiwar yên cerdewan jî diyar dibe ku; wan bi zanebûn xwestiye kesê zindî nehêlin da ku bikarin bûyerê bixin stûyê PKK'ê.

Sedemên vê wahşetê ne yek, gelek in, lê succarê vê wahşetê netenê xwînxiwarên mêrkûjin, succar di bingeha xwe de dewleta tirk bi xwe ye. Dewleta tirk ji dema damezrandina "Alayiyên Hemîdîye" û ta îro kurd bi kurd daye kuştin. Cerdewaniyê sistemeke birakuji û, kurdkujiyê ye ku ji alî dewleta tirk ve hatiye avakirin.

Ji roja damezrandina sistema cerdewaniyê heta niha bi destê cerdewanan gelek xirabî hatine kirin. Bi milyonan gundiyan kurd yên ku xwedî hesiyet û şeref bûn, nebûn cerdewan, neçar man û gundên xwe terk kirin. Mal û milkên wan, bax û baxçeyên wan, erd û zewiyên wan li gund man û cerdewanan dest dan ser û ji bo xwe bi kar anîn. Ji pênc hezar zêdetir gundên kurdan bi destê dewletê hatine valakirin. Yên ku li gundan man, cerdewananê dewletê ne. Mal û milkên gundiyan ku bûne koçber ji alî dewletê ve li ser cerdewanan hatine tapû kirin. Ev jî dibe sedemê nakokiyê di nav gundiyan koçber û cerdewanan de. Binêrin dewlet bi xwe wan bera hevûdu dide, dike dijminê hevûdu.

Dem a gundiyan koçber vediqerîn gundên xwe, dibînin ku cerdewanan dest daye ser mal û milkên wan û erdên wan ji xwe re diçînin. Ev nakokî di hemû gundên kurdan de di nav gundî û cerdewanan de heye û dikare bibe sedemê gelek bûyerên xirab di pêşerojê de. Cerdewanan êrişê gundiyan dikin, dixwazin wan ji gund bikin derve û paşve bişînin bajaran. Dewlet jî ji vî tiştî re çareseriyekê nabîne û piştgiriya cerdewanan dike.

Gundiyan ku bûn cerdewan destê xwe xistin xwîna birayên xwe, wan dan pêşiya leşkerên tirk û li dijî çekdarên kurd yên li çiyar şer kirin, wan kuştin û hatine kuştin. Hêzên tarî yên dewleta dagîrker a tirk li çend gundan li dijî cerdewanan qetlîam pêk anîn û kirin ser hêza çekdaran.

Cerdewanan jî dewletê alîkarî, piştgiri û hêz û qûwet girt û bi gundiyan birayên xwe xirabî kirin. Wan jî gundî kuştin û kirine ser hêza çekdaran. Cerdewananê mêrkûj ku di

vê bûyera dawî de 46 kes kuştin, li gor xwe planek çêkirin ku hemûyan bikujin û kuştina wan bikine ser çekdaran. Lê, ev plana cerdewanan biser neket û têk çû.

Eşîrtî li welatên kolonî, niv kolonî, welatên ku hatine dagîrkirin û ji alî dagîrkeran ve bi qestî paşve hatine hêştin û ji hêla aborî, siyasî û civakî ve gelek paşve mane, eşîretî hêj jî didome. Di çanda eşîrtiyê de, di adet, tore û kevneşopiyên eşîrtiyê de tiştên gelek xirab hene û hêj jî tene pêkanîn. Yanî bi kurtahtî eşîrtî kevneşopiyêke paemayî ye û di nav civakên paemayî de heye û herweha eşîrtî xwedî tradisyonêke nebaş e û kultureke wan ya gelek xirab heye. Kultura eşîrtiyê adet û toreyên wan, kevneşopiyên wan nebaş in.

Di nav her neteweyekê de kevneşopiyên baş û nebaş hene. Divê mirov yên xirab ji holê rake. Divê gel di hêla sosyal – civakî de bê perwerdekirin û bê hişyarkirin ku ew adet û toreyên nebaş pêk neyên. Hevûdu kuştin, şerê doza xwînê, eşîrtî, bûyerên wahşiyane di nav civakên paemayî de gelek pêk tên. Civak bê perwerdekirin dikare pêşî li van tiştan bigre.

Wahşet û qetlîama ku li gundê Mêrdînê hate pêkanîn bi çekên dewletê û ji alî sistemeke ku bi destê dewletê hatiye pêkanîn û hêzeke nebaş hatiye pêkanîn, rûda. Ev qetlîam bûyerêke jiberxweve pêk hatibe û bi destê kesekî ku dîn û har bibe, nehatiye pêkanîn. Ev bi plan û bi piştgiriya hêzên dewletê ji alî cerdewananê xaîn ve hatiye pêkanîn.

Encama vê bûyerê li hemberê doza kurd xirabiyê. Bi vê bûyera wahşiyane, dijminên doza netewa kurd çepikan lédixin û dibêjin "binêrin kurd wehşî ne, xedar in, mêrkuj in, nikarin xwe îdare bikin. Em dixwazin wan medenî bikin."

Ev bûyer tenê bi adet, tore û kevneşopiyên kurdan ve bê girêdan ji bo kurdan nebaş e. Di adet û toreyên kurdan de, di olên kurdan de –ola Zerdestî, Êzîdî û Îslamê – de pêkanîna wahşetên weha tune. Kuştina jin û zarokan tune. Rayedarên hukumeta tirk, kesên wekî Cemil Çiçek ku zîlamê Ergenekonê ye û ferdariya artêşa tirk ku dixwazin sistema cerdewaniyê pîrûpak derxin û succariyê bixin stûyê adet û toreyên kurdan.

Dewleta dagîrker bi kirinên xwe, zemîna qetlîamên weha amade dike. Ew ji bo pêşî li qetlîamên weha bigre nakeve nav tu hewldanek. Ew naxwaze ji doza kurd re, ji pirs û pirsgerêkên netewî û civakî yên kurdan re çareserî bibîne. Dewlet li çareseriyê nagere û lewre jî bûyerên weha pêk tê.

Di qewimandina vê bûyerê de, bi min armanca hêzên tarî, kesên ergenekonê û daxwaza ferdariya artêşê ev e ku mesaja; 'kurd paşverû û cahil in, toreyên wan belaya serê mirovahiyê ne û ew nikarin xwe îdare bikin' bidin cîhanê. Armançek din jî; şerxwazên dewlet û artêşa

tirk xwestin êrişê bavêjin stûyê PKK'ê û propagandaya 'PKK'ê sivil qetil kirin' li nava raya giştî belav bikin.

Dewleta tirk, ferdariya artêşê, hêzên tarî û cerdewananê xaîn bi vê kirina xwe biser neketin. Rûşeya wan derkete holê.

Kurdkujî û bûyerên weha wahşiyane rûşeya dewleta komara Tirk e! Kurdên welatparêz, pêşverû, demokrat, rewşenbîr, siyasatmedar û insanên xwedî wijdan ji ber bûyerên weha gelek xemgîn dibin. Li ber dikevin ku kurd bi destê kurd tene kuştin. Divê di qada netewî û navnetewî de dewleta tirk û sistema wê ya cerdewaniyê bê şermezarkirin.

Di festîvala navnetewî ya „Eurovision“ de Norwêj bû yekemîn



Avesta- 54.mîn Pêşbirkêya Stranan ya Eurovisionê li Moskova di salona Olimpinsky li darket.

Di Eurovision de 25 welat beşdar bûn.

Li seranserê cîhanê bi milyonan kesan girupên muzîkê temaşe kirin. Di pêşbirkê de Norwêj bi piraniya dangan bû yekemîn.

Di vê pêşbirkê de ku encama wê, bi puanên welatan tê diyarkirin, welatên ku navbera wan baş e, deng didin hev. Weke nimûne Ermenistan puanekî pir hindik dide Tirkiyê. Tirkiyê jî her wiha dengê xwe nade Ermenistanê, pêwendiyên welatan yên siyasî di encama vê pêşbirkê de roleke mezin dilîzin.

Stranbêjê Norwecî "Alexsander Rybak", bi strana 'Fairy Tale' 387 puan bi dest xist û welatê xwe kir yekemîn.

Eurovisiona 2010 'ê wê li paytexta Norwêj li Oslo were çêkirin. Welatê ku dibe yekemîn, Eurovisiona bê li wir pêşbirkê çêdibe.

H.Z. (Aknews)

DI 77 SALIYA KOVARA HAWAR'Ê DE

Konê Reş

Qamişlo, 15.05.2009

((Hawar zarokek nûza ye, zarowa me ye; zarowa kurdan e. Wek her zaro bi xweytiya dê û bav, bira û pismamên xwe dikare bijît. Her kurd dikare arîkariya Hawarê bike. Tu kes nebêje ku, ez mirovekî reben û nekêrhatî me. Ji min ji diayê pêve tiştek nayê. Belê tu kes vê xebere nebêje, her kes bi tiştekî, bi awakî dikare bê hawara Hawarê...))

Mîr Celadet Alî Bedirxan: (Hawar, hejmara pêşîn, rûpelê pêşîn, 15 ê gulana 1932)

Bi hatina 15 ê heyva gulanê, sala îsal 2009, kovara Hawarê dikeve 77 saliya xwe de, ango 77 sal di ser derçûna (HAWAR)ê re derbas dibin. Ev kovara ku yekem car e di dîroka kurdan de, bi tîpên latînî hatiye weşandin û ji hingê ve zimanê kurdî bûye zimanekî xweser..

HAWAR, kovareke panizdeh rojî bû, di warê ziman, ferheng û rewşenbîriya kurdî a têvel de şoreşeke nû bû û dîrî siyasetê bû. Her wiha xwediyê wê Mîr Celadet Bedirxan di rûpelê pêşîn û rêza pêşîn de, armancên Hawarê diyar kirine û dibêje:

((Hawar dengê zanîne ye. Zanîn, xwe nasîn e, xwenasîn ji me re rîya felat û xweşiyê vedike...Hawara me berî her tiştî heyîna zimanê me dê bide nas kirin. Lewma ko ziman şerta heyîne a pêşîn e...Hawar ji iro û pêve bi her tiştê ku kurdanî û kurdîti pê bendeware, dê mijûl bibe. Tenê siyaset jê dûre, xwe naêxe siyasetê. Hawarê siyaset ji civatên welaî re hiştiye. Bi siyasetê bila ew mijûl bibin. Em jî di warê zanîn, huner û sinetê de dê bixebitin.))

Wek ku hûn tev dizanin xwedî û berpirsiyarê kovara HAWARê Mîr Celadet Bedirxan bû. Cih û warê çapa wê wek ku li ser hatiye nivîsandin: Çapxana Tereqî 1932 Şam / Taxa Kurdan.

Hawar bi du zimanan dihat weşandin; Kurdî û Fransî. Rûpelên kovarê bi tevayî dor 20 rûpelan bûn. Beşê fransî 2-4 rûpel bûn. Beşê kurdî ji hejmara 1- 23 an bi du alfabeyan dihat nivîsandin; Erebi û Latînî. Lê ji hejmara 24' an û pê de, bi tenê bi alfabe ya latînî hat nivîsandin. Dema ku mîr

Celadet Bedirxan hejmara pêşîn ji Hawarê belav kir, hingê wî alfabe ya xwe bi zimanê erebî, tirkî, farsî, û fransî diyar û eşkere kir: Bi derketina kovara Hawarê re, welatparêzên kurdan xwe li dor dane hev, nemaze ewên ku ji ber zilm û zora Tirkan reviyabûn Binxetê. Hingê piraniya wan li Şamê, di bin rûniştina zorê de bi cî û war bibûn. Bi girsbûn ji axa, beg, şêx û rewşenbîrên kurdan bûn. Tevan xwe li mîr digirtin û rûpelên kovara wî bi berhemên xwe dixemilandin. Gelekan ji wan hiç xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî nekiribûn. Hinek jî hebûn qet neçûbûn dibisatanan, ew di rêka kovara Hawarê de hînî xwendin û nivîsandina zimanê kurdî latînî bûn..

Di destpêkê de, bi tenê Mîr Celadet û birayê xwe Dr. Kamîran bi nivîsarên xwe, Hawara kurdan dineqîşandine, û bi gelek navan, bi tenê Helbestvan Qedîrî Can, ji hejmara pêşîn de bi wan re beşdarî kiriye. ango ew nuxuriyê Hawarê ye. Di hejmara dudiwan de, Osman Sebrî xwe berdaye nav karwanê nivîskarên Hawarê.

Di hejmara sisyan de, Hemîd Ferec ji Kurdistana Başûr Hawar piroz kiriye û Dr. Ahmed Nafiz beg Zaza, wek bijîşkê Hawarê, di quncika bijîşkî de nivîsandiye. Lê ji hejmara çaran û pêde, hawar bi helbest û nivîsên van kesan hatiye xemilandin wek: Cegerxwîn, Mustefa Ehmed Botî, Nûreddîn Zaza, Lawê Findî, Hesen Hîşyar, Reşîdê Kurd, Ehmed Namî û Qedîrî Cemîl Paşa..Hwd. Hem jî ji Kurdistana Başûr van nivîskarên bi nav û deng di Hawarê de nivîsandine wek: Fayîq Bêkes, Goran, Tewfîq Wehbî, Şakir Fetah, Hevîndê Sorî, Abdulkaliq Esîrî, Pêrût, Lawikê Kurd..hwd. Her wiha rûpelên Hawarê ji wan kesên ku nû xwe fêrî xwendin û nivîsandina kurdî kiribûn vekirî bû... Belê beşê fransîzî, ji bîl ku Mîr Celadet û birayê xwe Dr. Kamîran, bi gelek navan di vî beşî de dinivîsandin, van kurdenasên biyanî jî ew beş dixemilandin wek: Pr.G. Michaelian û R. Lescot.

Emê vegerin ser kovara (Hawar)ê, ewa ku me got kovareke 15 rojî bû, belê cihê daxê ye ku ev kovar ji ber rewşa aborî û ciyopolîtîkî, tev hejmarên wê li ser hev nehatine çapkirin li gor programê xwediyê

wê, û paşê jî hatiye rawestandin.

57 hejmar ji HAWAR ê, di navbera sala 1932' an û sala 1943' an de, hatine weşandin. Ev kovara bedew û serbê, ji ber rewşa aborî di sê qunaxan re derbas bûye, ta ku hatiye rawestandin. Di gotara bi navê (sê tarîxên Hawarê) de, hejmara 27 sala 1941', mîr Celadet wiha dibêje:

Tarîxa pêşîn, 15 gulana 1932' an, di vê tarîxê de, gazî û hawara kurdan ji dil û devê wan ketine nav rêz û xêzikên çend rûpelan û kovarek kurdî anîne pê, ji kurdan re Hawar, hawareke nû, hawara zanînan danzanîne za..

Temenê Hawarê yê aktiv sê sale, lê ji ber rewşa aborî, ya ku Mîr tere derbas dibû, yazdeh salan pêre dirêj kiriye. Hejmara pêşîn (1) ji vê kovara bedew di 15 ê gulana 1932' an de hatiye weşandin, hejmara dawîn (57) di 15' ê tebaxa 1943' an de hatiye weşandin

Hawar, ji hejmara 1- 23, di roja 25 tîrmeha 1933'ê de, bi dûv hev de hatiye weşandin, hejmara 24' an di roja 24' ê nîsana 1934' an de derketiye, hejmara 27an di roja 15 nîsana 1941' ê de hatiye weşandin, ta ku hejmara dawîn 57 di roja 15 ê tebaxa 1943' an de hatiye weşandin û êdî nema Hawarê ronahî dîtîye.

Ji bo zanîne, hêjaye em bêjin, ku Mîr Celadet Alî Bedirxan kovareke din, di sala 1942' an de, bi navê (Ronahî) li Şamê çap û belav kiriye, anku ji berî 65 salan ve. Ew jî xurû bi kurdiya latînî bû. 28 hejmar ji vê kovarê hatine çap û belavkirin, hejmara pêşîn (1) di yekê nîsana 1942' an de hatiye weşandin, hejmara dawîn (28), di meha adara 1945' an de, hatiye çap û belavkirin, û êdî Ronahî jî, wek xaîşka xwe Hawarê hatiye rawestandin.

Bi vê helkeftina ku heyva gulanê, ji berî 77 salan ve sînga xwe ji kovara Hawarê re vekiriye, û mizgîniya zayîna kovara (HAWAR) ê daye me, em xwe gelkî bextiyar û kamîran dibînin û sed rehmê li gîyanê Mîr Celadet û Dr. Kamîran Alî Bedir-Xan û tev neferên malbata wan bibare, buhişt cih û warê wan be.

Berhemek nû

"Kurdistan û Kurd Le Rowangey Nexşevaniye Ve"

Pirtûka "Kurdistan û kurd le rowangey Nexşevaniye ve", ku vekolîneke li ser nexşevaniya kurdî, bo cara yekemîn bi awayek bi belge û pişt qahîm bi neqşeyan ku zêdetirî 100 neqşe li warên dîrokî, aborî, coxrafiya, siyaset, û civakî li xwe de cih dane, kete ber destê xwendevanan û bi vê çendê ji pirtûkxaneya kurdî bû xwediyê

berhem û çavkaniyek nû û dewlemend.

Pirtûka han ku 511 rûpel e, ji aliyê **Worya Rehmani**, pêşmergeyê PDK Îranê ve hatiye berhev kirin û hebek ji wê jî pêşkêşî pirtûkxaneya me kiriye ku em jî serbarê pîrozbahî, destxweşî û mandînebûnê, herweha serketin û berdewamiyê di kar û xebatên wî de bihêvî dixwazin.



Gola Urmîyê Bi Kirîza Hişkbûnê Re Rûbirû Ye

► Asta ava gola Urmîyê di wan çend salên dawiyê de gellek kêmbûye û doma wê rewşê pêvajoyê, gola han tevî kirîza ziwabûnê rûbirû dike.

Sedemên mirovî û her wiha diyardeya hişkesaliyê di çend



salên borî de, asta ava gola Urmîyê li hember ava deryayên azad, 1271 metr û 64 santîmetr kêmbûye ku ev radeye li gor mehekê berî niha 3 santîmetr kêmbûye.

Tehmûrs Kelanterî, rêveberê giştî yê Parastina Jîngeha parêzgeha Azerbaycana Rojava gotiye ku bi kêmbûna asta ava gola Urmîyê, radeya xwêya ava wê golê, 360 girem di lêtrekê de zêde bûye. Lêkolîn nîşan didin ku gola Urmîyê weke duyemîn gola şor li cîhanê, heya dema kêmtir ji 20 salên din, dê tevî kirîza ziwabûnê rûbirû bibe.

Li gor gotina wî rêveberê jîngehê, asta ava gola Urmîyê li hember sala borî metrek kêmbûye.

Gola Urmîyê bi qasî nêzik 8 milyar metrên sêcî(mukeyb) û rûberê wê nêzikî 5 hezar û 500 kilometrên çargoşe ye. Dirêjîya wê golê 135 kilometr û panatiya wê 55 kilometr e û kûrtirîn cihê wê jî 16 metr e.

Pilingên Tamîl Rastî Çarenivîsek Nexuya Hatîn

► Di heftiya borî de êrîşa hêzên dewleta "Sri Lanka" bo ser Pilingên Tamîl, bala hemû medyayên cîhanê bo aliyê xwe rakîşand. Şerê navbera arteşa "Sri Lanka"yê û Pilingên serbixwexwaz



ên Tamîl ku ji sala 1983'an heta îro (26 salan) dom kiriyê, zêdetirî 70 hezar kes kuştî, dehan hezar birîndar û sedan hezar kes aware û derbider lê ketiye, di heftiya borî de rastî tîkçûnek xurt hat û li gorî agahiyan, serokê Tevgera Pilingên Tamîl (Vellupillai Prabhakaran) jî yê hatiye kuştin.

Arteşa dewleta "Sri Lanka" jî çend mehan berî niha ve Pilingên Tamîl di vî herêmê de kiribûn bin dorpêça xwe û ji erdê û hewa êrîşî ser wan dikir. Ji ber êrîşên berfireh ên arteşa "Sri Lanka"yê, pilingên Tamîl êdî nekarî berxwedanê bikin û çekên xwe danîn. Çarenivîsa wan nexuya ye.

Bo Cara Yekemîn 4 Jin Çûne Parlamentoya Kuweytê

► Ajansên Nûçeyan ragihandin ku di encama hîlbijartinên Parlamentoya Kuweytê a roja 16'ê Gulana 2009'an de, bo



cara yekemîn di dîroka siyasî a Kuweytê de, 4 jinan karî di hîlbijartinên han de serkevtinê bidest bixin û bibin parlamnterên wî welatê Erebbî.

Jinên Kuweytî di sala 2005'an de, mafê beşdarî di hîlbijartinan de bidest xistin. Eva destpêkek nû û destkevtê mezî ji bo jinên Kuweytî ye ku nûnerên jinan dê beşdariyê di proseya siyasî, biryardan û qanûnadanînê de bikin.

Behmen Qubadî: "Ez Dê Îranê Bicî Bihêlim"

► Radyoya Almanîya hevpeyvînek tevî Behmen Qubadî belav kir ku têra xwe balkş e. Di wê hevpeyvîne de Qubadî dibêje: "ez dê Îranê bicî



bihêlim". Filma nû a derhênerê navdar yê Kurd, Behmen Qubadî ya bi navê "Kesê haj pişikên Îranî nine" ku di Festîvala navneteweyî ya "CANN"ê de beşdar e, di roja duyem a wê festîvala filman de hate nîmayîşkirin û digel pêşwaziyek germ berbirû bû.

Behmen Qubadî di hevpeyvînekê de ragihandiyê ku bi sedema rewşa dijwar a çêkirina filman di Îranê de, ez dê welatê bicî bihêlim û herim bo Almanîya.

Qubadî ev filma nû bi dizî ve û bi awayekî neqanûnî li Tehranê çê kiriyê û çîroka wê serpehatiya komek ciwanên alîgir û hezkerên hunera muzîkê ye ku di Îranê de bi nepenî û veşartî karê muzîkê dikin. Behmen Qubadî dibêje ku ew dê ji boy çêkirina filman di rewşeke baştir û azadanetir de li Îranê derkeve û li Almanîya bimîne. Di dawîya hevpeyvîna xwe de Qubadîyê derhêner dibêje: Wî hêz û şîyanek zaf heye, lê tenê di rewşeke azad de ye ku hêz û karîna mirov pêşde diçe û peyama xwe digehîne raya giştî.